



**Kurdocide Watch-CHAK**  
**Dezgeha mafê mirovan ya li diji jenosîdê**  
**Navenda Helebceya Şehîd ya li diji jenosîdên Kurda û Enfalê- CHAK**

**Divê zextên rejîma Suriyê li ser Kurda raweste:**  
**Azadî ji bo dengbêjê Kurd Bavê Selah!**



Hejmara Kurda li rojavayê Kurdistanê 2 milyon 500 hezar e. Di çarçoveya tixûbên fermî yê Suriyê de, hejmara Kurda ji % 12 ye.

Piştî parçekirina Kurdistanê û xwekişandina fransiyayî ji rêvebirîya Suriyê, erebên nasyonalist hatin ser hikûm. Di sale 60 î de, di çarçoveya projeya "Kembera Erebi" qonaxa jihevduxistina (sînoran) kurdên bakur û rojava dest pê kir. Biryara 10 km valakirina ser herdu sînoran hate rojevê û mafê lêkirina xaniyan û çandiniyê hate sînorkirin. Paşê, bi dekrêta 49 an ya serokomarê Suriyê rêya çandiyê û kirêkirin, firotin, kirîn û lêkirina malûmilka xiste bin kontrolê. Sînorkirina çandinî, lêkirinê û zextên rejîmê rê ji bo hejarbûn û koçberiyê vekir. Hejmarek mezin ji Kurda bûne koçer û li derûdora Şam û Helebê di konan de bi cî bûn.

Bi heman projeya nijadperest ya Beasiyên Suriyê, 300 hezar Kurd li ser xaka xwe, bê hemwelatî û biyanî (kitim) hatin hejmartin.

Ji ber bêhemwelatî, kitim hiştin û encama dekrêta 49 an bi hezaran zarokên Kurda, ji "**peymananavnetewî ji bo mafê zarokan**" bêpar hatine hiştin. Mafê zarokan yê sihetê û perwerdê nayê nasîn.

Zexta rejîma Suriyê li diji Kurda bi xurtî didome. Di 24 çileyayî paşîn 2011 an de, dengbêjê Kurd Bavê Selah (Abdurahman Mihemed) ji aliyê hêzên ewlekariya Suriyê li Helebê, bi şêweyekî kêfî, bêyî sucê wî bê diyarkirin hate girtin. Bavê Selah nexweş e, şekirê wî hildikişe, bê derman û di mercên zindanê de dikare nexweşiya wî dijiwartir bibe û rewşa wî giran bibe.

Em, dezgeha mafê mirovan **Kurdocide Watch-CHAK** mina dezgeha "**Amnesty International**" hizir dikin:

- Divê di zûtirîn wext cihê Bavê Selah bê diyarkirin û rê ji bo ziyareta malbata wî bê vekirin,
- Bavê Selah nexweş e û divê dermanê wî bê dayîn,
- Bavê Selah bê suc û divê bê şert û merc bê berdan.

Daxwaziya me ji raya giştî, Neteweyên Yekgirtî (UN) , Yekîtiya Ewropayê (EU) û dezgehên mafê mirovan ew e ku bê deng nemînin û ji bo parastina mafê mirovan yê Kurda li Rojavayê Kurdistanê û azadiya Bavê Selah zexta xwe ya li ser Suriyê zêdetir bikin. 23 sibat 2011

## **Kurdocide Watch-CHAK** **Komiteya Karger ya Navendî**

**Goran Halabcayi**  
Serok

**Gabar Çiyan**  
Çigirê Serok

**Hîwa Nasih**  
Sekreterê Navnetewî

**Kader Nader**  
Dîrektorê Ragihandin û Çapemeniyê

---

**Agehdari:** Kampanya Amnesty International li ser pirsê:  
<http://www.amnesty.org/en/news-and-updates/kurdish-folk-singer-syria-goes-missing-after-arrest-2011-02-22>